Di aslê xwe de wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê di awayekê de wê, aliyê rûhiyetê ku wê bi wê re wê di awayekê de wê weke ku wê were dîtîn wê bi temenekê fîzyolojîkî a qasî re wê çawa wê, rêyên wê yên bûhûrînê wê werina kifşkirin û wê bi wê re wê ew wê, were pêşxistin bê.

Di mijara anatomiyê de wê, di wê temenê de wê, di awayekê de wê dikarê wê, weke aliyekê wê yê giring wê werênê ser ziman ku wê, rewşên laş ên germ, cemdîdî, rewşên hem negerm û hem necemidî û hwd re wê, di awayekê de wê were li gorî wan wê were hizirkirin. Di aslê xwe de wê di wê temenê de wê, rewşên weke yên mudahaleyên weke minaq li deverên hişk ên laş bo nermkirinê wê bi wê re wê weke aliyekê wê yê din wê xwe bide nîşandin.

Ku mirov hinekî li ser çerçoveya wê bi rengê hizirkirinê a li ser vejenê re wê bikê ku wê fahmbikê wê **giring bê**. Piştgiriya hevdu û vexwarina hevdu di navbera Yin û Yang de; Hîperaktîvîteya exogenîk a pathogenîk Yin (serma û şiliyê) kêmbûna enerjîya fonksiyonel a laşê mirovî Yang diafirîne, û enerjîya fonksiyonel a yangê bi zêdebûna 'yin' re xwezayê sar diafirîne. Di zêdeyîya faktorên pathogenîk ên yang de (ba, germahî, zuwabûn), şilavên laşê yin di laş de bi hêsanî têne kêmkirin û kompleksên nîşaneyê yên bi germ (germ) çê dibin, yang bilind dibe 'yin' birîndar dibe. Bi hîpaktîviya berxwedana laş re, Xu (kêmasiyê) Kompleksên nîşanên germ an sar têne çêkirin. Ji ber ku patolojiyên van her du ji hev cûda ne, awayên dermankirinê jî cûda na. Dema ku prensîbên dermankirina germ ji bo kompleksên nîşanên sermayê têne sepandin, rêbazên dermankirina sar ji bo kompleksên nîşanên germ têne

sepandin, di nexweşên Xu de xortkirin û di nexweşiyên Shi de dermankirina aramker tê sepandin.

Têkiliya navbera Yin û Yang; Ev tê vê wateyê ku yek bêyî yê din nabe. Ji ber vê yekê ger yang tune be, yin jî tune. Bi gotineke din, ger şev tune be, roj jî tune ye, û ger heyecan nebe, astengî jî tune. Dema ku Yang li ser bingeha Yin´ -ê(mê) heye, Yin –a(nêr) li ser bingeha Yang -ê jî heye, ew heya ku ew piştgiriyê bidin hev û di heman demê de di hebûnek yekane de wê jî hebin. Ev têkiliya hev girtî ya hevbeş hevahengiya Yin û Yang û hevsengiya di navbera wan de diafirîne, û ev hevsengî û hevrêzî garantiya girîng a çalakiyên fîzyolojîkî ye. Guheztiyên patolojîkî çêdibe dema ku balans û ankû ahenga têkildar a di navbera Yin û Yang de winda bibe (çav: roberto, Margotta(1996), Medisinens historie, inn på norwegian ).

Berevajiya Yin û Yang; Yin û yang xwedî karakter û taybetmendiyên cihêreng in. Ger di navbera du tiştan de têkiliyek dijberî tune be, ew nikarin di yin û yang de bêne veqetandin. Yin û yang tenê ji bo berhevdana tiştên heyî, şirovekirina lihevhatin û veguheztinên di guheztina şert û mercên cihêreng de, ji bo şirovekirina veguheztina du tiştên berevajî, wêne an dîtîne hene. Yin û yang ne tiştên bêkêmasî ne, wateyek wan a bi tevahî realist heye. Mînaqî, laşê mirov li yin û yang dabeş dibe. Dema ku rûyê dervê laş yang e, uzwên (organên) Zang-Fu (uzwên navxweyî) bi karakterê yin in. Dema ku beşa derveyî laş yang bê, pişt yang bê, û sing û zik jî yin in. Uzwên Zang-Fu jî li yin û yang tene dabeş kirin.

Di dewama wê de wê weke aliyekê din ku wê di temenê wê de wê were ser ziman wê têngîna teoriya ´pênc elementan´ bê. Wê ev jî wê di awayekê de wê weke aliyekê wê yê din ku wê di nava wê de wê, were ser ziman bê. Wê çerçoveya wê ya fahmkirinê wê bi wê rengê wê were ser **ziman**. Ev teorî(*teroîya pênc elementan*) şîrove dike ku her tiştê ku di xwezayê de heye, ji tevger û guhertina pênc elementên bingehîn pêk tê. Eva; DAR, AGIR, ERD, METAL û AV in. Di Dermanê Kevneşopî ya Cîne de, teoriya pênc hêmanan elementî e ji bo nixandina têkiliyên fîzyolojîkî û patolojîkî di laşê mirovan de bê. Ev tê wateya mezinbûn û geşbûn, jîyan, zindîti û hwd ê. Zindî mezin dibe, pêşve diçe û bêkêmasî radibe. Têkiliyek di navbera pênc hêmanan de bi şeweyê piştgirî û astengkirina hevdû heya. Mînaq, dar agir diafirîne, agir dibe xwelî û dibe ax. Metal di erdê de ye. Madenên ku kevirên avahiya laş in, di axê de ne û av jîyanê simbolîze dike, ankû hêmana ku jîyanê dide dar û agir vemirîne av e.

Têkiliya astengkirinê weha ye. Ew bi reyên xwe yên dar axê digire û nahêle ku ew biherike. Ax av digire. Çawa ku metal dar disekine, dar jî axê disekine. Çînî ji têkiliya di navbera pênc hêmanan re dibêjin têkiliya DAYIK-KUR. Çawa ku dayik zarokê xwe têr dike, ew jî zêdeyiyên wê radike.

Di dewama wê de mirov dikarê hinekî jî li ser têtgîna akapunkturê wê bihizirê û wê çend gotina bi wê bêtê ser ziman. Wê wateya wê ya sereka wê ev bê ku wê, çawa wê xwe nûbikê wê bi wê were ser ziman. Di nava fahmkirina wê de wê, aliyekê tûra sînîrî, qasî û di dîmenê wan de a rûhiyetî û hwd re wê, di awayekê de wê bi wê re wê, were hizirkirin. Wekî din wê kevirên weke yên şamtînokî, terzîyên zîvroke ên ku ew bi navê 'locus' wê werina ser ziman wê werina bikarhanîn. Ev şêwayên ku wê werina kirin wê di awayekê de wê rewşa êşê wê di nava kombînasyonê de wê were hizirkirin. Minaq weke ku em di nava kurdên dema kevnera de dibînin ku wê, çawa wê, devera weke serî diêşihê wê bi dewisandina li ser wê re û ankû girêdana serî ku wê bibin wê di dîmenekê wê rengê de wê awayekê wê were dîtin. Wekî din di nava kurdên wê demê de wê şêwayê weke "qadeh avêtina li piştê" û hwd wê hebê. Di wê temenê de wê, tiştê weke ku wê kûr û hundirê wê pîr zêde germ ku ew didênina ser piştî û ankû devera biêş wê bi wê biheta bawerkirin ku wê wê êş bikişanda. Ev şêwa wê di awayekê de wê weke ku em dibînin wê, di nava şêwayên akapunkturî wê piştê li herêmên din ên Asya weke yên din jî wê were dîtin ku wê were bikarhanîn. Rewşên weke yên nexweşiyê ku wê bi wê re wê weke ku wê werina başkirin ên weke astimê, serêşî, bizekimketinê, sînozît, bronşît, pîrsgirêkên serifendinê, rewşên weke yên rayên xwûnê, yên zikçûnê, nekarîna kirina destavê û hwd wê hinek ji wan rewşên ku wê bi wê bixwezînin ku wê werina başkirin bin. Weke van gelek rewşên din ên weke yên serçerm, binçerm, kişîna ji hev a qasan û ankû êşa qasan û hwd wê, bi wê re wê bêt xwestin ku ew werina başkirin. Weki din di pîrsgirêkên weke yên derûnî ên weke stress, depresyon û hwd de wê, di awayekê de wê, bê dîtin ku wê weke ku wê were bikarhanîn. Ber ku wê, bi şêwayên wê re wê têkiliyekê wê bixwezê bi sînîran re dênê wê di awayekê de wê, di nava hewldana rehetkirinê de bê. Lê li vir di rewşên başkirinê de divê ku ew kesê ku ew wê bikê pîr zêde li wê bizane û bizanebûna xwe re serwer bê. Ji wê baş fahmbikê û zanibê ku ew çî dibê bê. Weki din di rewşên weke yên romatisma û hwd de jî wê bê dîtin ku wê werê bikarhanîn.



Şêwayên weke yên akapunkturê û hwd wê, di awayekê de wê, li ser rewşa kişîna qasan û ankû êşbûna wan re wê xwe diyê temenekê fahmkirinê bin. Lê di wê temenê de wê di aslê xwe de wê di temenê de wê têtînek anatomikî a li ser awayên kifşkirina 'nûqtayên jîyanî' û hwd re wê bi wê re wê weke bingihînê wê hebê. Di awayekê de wê temenê wê li ser hîskirin, hêst û rewşek dîyardeyî ava bê. Wê di wê çerçoveyê de wê, di awayekê de wê, dema ku wê başkirin wê bê kirin wê ev rewş wê li berçav wê bên girtin.

Wekî din wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê, weke şêwayekê mudahaleyâ li qasan bê. Wê di çerçoveya wê têtîna wê ya tendurustî de wê, aliyên wê yên ku wê pêşkevin ên weke bi derzîyê terekirin, weke bi masajê firkandin û her wusa bikarhanîna kevirên germ û ankû sar li deverên laş ên diêşihin wê bê bikarhanîn. Masaj û ankû firkandin wê di awayekê de wê li ser girêdanên fîzyolojikî ên ji çerm li hundûr û uzwen hundirî ku wê çawa wê têtîliyê wê li ser esas û erk û karê van ve wê bi wan re wê dênê û wê di wê temenê de wê xwediyê awayekê bê. Bi gotineka din wê çawa wê uzwan wê di awayekê de wê, bigihênê li funksiyonên wan ên esasî û wê di wê temenê de wê, di nava wê rewşa wan de wê ji ne rehetiyê wê derxê û wê bikê rehetiyê.

Ji aliyekê din ve jî wê rewşa firkandinê wê di awayekê de wê, ku ew rast û li gorî rêgezên wê yên rast werina kirin wê, di awayekê de wê, di rehetkirina sînîr û qasan û bi teybetî a hastûyan de wê encamên wê di awayekê de wê karibin xwe bidina dîyarkirin. Firkandin li gorî rewşên wê yên ku ew bên kirin, nerm, hişk, bi ava germ, bi avasar û ankû bi gelek rewşên ên weke wan re wê were kirin.

Di wêwarê de di derbarê rewşa dermangeriyê de di dewama wê de wê dikarin wê werênina ser **ziman**. Di demên xanedanên Xia, Shang, û Zhou de wê li çînê (ji dawiya sedsala 22 -an berî zayînê heya 256 -an BZ), vexwarinên dermanî ên weke bi araqê(şarabê) û avên dermankirî dikarin bêne çêkirin. Berhevokek helbestên bi navê "Shijing" ku di Xanedaniya Xizhou de hatî weşandin (dora sedsala 11 -an - 771 b.z.) hatî weşandin ew pirtûka ku dermanên herî kevin ên ku hatine dîtin vedibêje. "Neijing", pirtûka herî kevnare ya li ser teoriya dermanê çînî ya naha tê zanîn, teoriya bingehîn a dermanê kevneşopî ya Çînî bi danîna rêzek teoriyên dermanên kevneşopî yên Çînê saz dike.

Pirtûka dermangeriyê ya herî kevn a ku heya niha hatî dîtin, pirtûka dermanê gihayî ya bi navê "Shennong Bencaojing" bi kortkirina agahdariya ku ji hêla gelek pisporên bijîjkî ve di navbera serdema Qan û

Xanedanên Xanî (221 Beriya Zayînê - 220 Zayînî) de hatine berhev kirin. 365 cureyên dermanên di vê pirtûkê de îro jî têne bikar anîn. Weşandina vê pirtûka dermangerîyê damezrandina bingehên dermangerîya kevneşopî ya Çînê û wê rengê başkirinê a bi şîniyan wê destnîşan kir. Pêşketina aboriya li xanedana Tang (618–1644) bû sedema pêşkeftina dermangerîya kevneşopî ya Çîna demê jî. Hikûmeta Tang yekem car xebata sererastkirina pirtûka li ser dermanê giyayî, ku li cîhanê wekî "Tang Bencao" tê zanîn, qedand. Di tevahiya pirtûkê de, bi tevahî 850 dermanên giyayî hatine berhev kirin û bi wêneyan hatine vegotin. Bi vî rengî, dermangerîya kevneşopî ya Çîna demê bêtir hate pêşve xistin (çav: roberto, Margotta(1996), Medisinens historie, inn på norwegian ).

Ji hêla xanedana Ming (1368-1644), dermanfiroşê Cînî Li Shizhen di 27 salên xebatê de xebata dermangerîyê ya kevneşopî ya Cînî "Bencao Gangmu" qedand. Tevahiya pirtûkê 1892 dermanên nebatî vedibêje, û ew dike mezintirîn berhevoka dermanên nebatî di dîroka dermanê giyayî yê Cînê de. Avahiya erdnîgarî ya tevlihev, şert û mercên avhewa yên cihêreng û hawîrdorên cihêreng ên xwezayî yên li Cînê, ku xwedan axek fireh e, ji bo hilberîna dermanên cihêreng şert û mercên guncan peyda dibêt. Zêdetirî 8,000 dermanên kevneşopî yên Cînî wê demê li Cînê têne hilberandin. Hejmara dermanên nebatî yên ku bi domdarî têne bikar anîn ji 600 derbas kiriye. Dermanên kevneşopî yên Cînî ji hêla hejmar û cûrbecûrîyê ve li cîhanê di rêza yekem de ya.

Ev wê di demên piştre de jî wê xwe di awayekê de wê bi wê re wê bide domandin. Li dora kesên pispore wê ev wê, karê pêşxistin û ankû çandiniyê ên şîniyan wê bê kirin. Wê ev wê weke bijîşkna kevneşopî ên di derbarê şîniyan de bizane bin û wê di herdemê de û piştre jî wê serî li wan wê biheta xistin.

Têgîna tendurusta çînê wê piştre wê, dema ku wê hin bi hin wê çerçoveya tênga xwe ya tendurustî a hemdem wê pêşbixê de jî wê ev wê ji wê re wê pêşî wê weke temenekê wê biafirênê. Piştre wê ji wê derhanîn û bi fahmkirinên ji hewirdoirê re jî ew wê bê pêşxistin. Di wê temenê de wê, weke têgînek tendurust bi sazûmanî û dualî ku wê di wê temenê de wê xwe di zikhevdû de wê bide pêşxistin.

Ku em têhîna tendurusta hemdem jî û ya kevneşop jî li berçav bigirin wê bi wê re wê dikarin wê werênina ser ziman ku wê hertimî wê ji xwezayê wê sûdwergirin. Di dewma wê de wê ev xwezaya ku ew çavkaniya wê ya wê di wê temenê de wê, aliyên ku ew di çerçoveya têgîna tendurustîya xwezayî de dihê û pêşdikeve jî wê di awayekê de wê,

bi encamên wê yên ku ew bûna re wê, ji têngînên tendurustî ên hemdem re jî wê bê peyxam. Ev jî wê weke aliyekê wê yê din ê biqadr ku mirov wê pêşwazî bikê bê.

### **Têgîna tendurustê a hindî**

Bi peyva Sanskrîtî "Ayurveda" tê wateya "Zanistiya Jiyanê". "Ayur" tê wateya jiyânê û "Veda" tê wateya zanînê. Ayurveda dikare wekî "zanîn an zanistiya jiyana dirêj" were wergerandin. Ew pergalek lênihêrîna tendurustî ya kevnarê bê. Di destpêka têngînên sereke yên dermanê Ayurvedîk de dabeşkirina laş li sê beşên sereke yên bi navê "dosha" ye. Eva; Vata, Pitta û Kaffa ne. Tê pejiwandin ku yek ji van dosha di her kesî de serdest e û ku her dosha fonksiyona xweya tevayî li gorî şewazek bêhempa ya jiyânê (xwarin, hwd.) a. Diparêze. Teşhîsa di dermanê Ayurvedîk de bi vekolîna dîtbar û destî û lêpîrsîna nexweş ve tê peyda kirin. Wekî din, jêrîn têne kirin: tespîtîkirina pêl, mîz, stû, ziman, çav, çerm, axaftin - deng û xuyangê giştî dihê kirin. Kapasîteya dehandinê, adetên kesane, wêneya laş, berxwedana nexweş jî têne berçav kirin. Wekî din, di tespîtîkirinê de nişanên têkildarî nexweşiyê têne dîtîn û ceribandînen cihêreng jî têne sepandin.

**Di aslê xwe de** wê dema ku mirov bahsa têngîna tendurustê a hindî bikê wê, weke pêvajoyek tendurustî ku mirov wê di bin du beşan de wê werênê ser ziman dikarê wê werênê ser ziman. Pêvajoya tendurustî a kevnêşop ku wê di bin navê 'Ayurveda' de jî wê were binavkirin û wê ev gotin ku wê were wateya 'zanîna jîyanê' wê di wê temenê de wê, bi rengekê wê were ser ziman. Aliyê din jî wê pêvajoya tendurustê û pêşveçûnên wê yên bi ber demên hemdem ve bê.

Lê di wê temenê de ku wê, temenê hindûîsmê bê wê di awayekê de wê têngîna tendurusta kevn wê di awayekê de wê, di awayekê de wê gelek aliyên wê yên ku mirov wê fahmbikê û wê werênê ser ziman wê hebin. Wê weke avakarê zanîna ayurveda jî wê dhanvantarî wîşnû wê were dîtîn. Ev jî wê li ser kokeka ku wê bi brahmanîsmê ve wê were girêdan. Wê têngîna brahman wê di aslê xwe de wê, di awayekê de wê, li mesopotamya jî wê were dîtîn. Di kurdî de wê wateya gotina 'brahman' wê di wate 'rûhê me' û ankû 'gîyane me' de wê karibê were fahmkirin. Wê li ser Ayurvedavatare re wê ayurveda wê ew wê girêdanê wê bi wê re wê bi xwe re wê çê bikê.

Li gorî wê vegotina wê ya mitolojikî ku wê li ser 'vedikan' re wê were ser ziman wê bê gotin wê ji brahma wê zanîna wê naqlî Daksha Prajapati were kirin. Piştî wê li parastvanê brahma indra wê were ragihandin. Wê weke mirovê pêşî ku wê ji indra wê fêr bibê wê, bharadvaja bê. Ew jî wê li komêk zanyar radigihênê û naqlî wan dikê. Ayurveda wê pêşî wê bûhûrî li agnivesh wê bibê Piştî wê, keve destê charaka û ew jî wê jinûve wê rast bikê û wê bi navê charaka samhîta wê werênê ser ziman. Wê weke bavê aliyê wê vedikê cerrehî wê Dhanvantri Sushrut bê û wê di dewama wê de wê, li dora hezar salî berî zayina îsa wê ji nûve wê bi destê Sushruta Samhita were berhev kirin. Ku wê hinek darêjkê wê di xwe de wê bihawênê Atharvaveda wê weke vedayan wê giring bin. Wê di awayekê de wê piştî wê bi ayurvedik wê were pêşxistin û ev dema wê taqabûlî dema derketina bûdûsmê wê were kirin. Dîroka ayurveda a ku ew dihê nivîsandin wê li gorî wê bê gotin ku wê li dora sê-hezar salan wê pêşkeve. Wê di nava têngîna hindî de wê di başkirina nexweşiyên Bhaishajyam de wê bê bikarhanîn û wekî din di nava de wê hinek têngînên weke temenekê dirêj rehetiyê weke bi navê 'Ayushyams' bînin wê bi wê re wê were ser ziman.

Ayurveda wê weke têngînek ku wê pêşîya nexweiyê girinê, parastina sihatê û başkirin û ankû dermankirinê bê. Di têngîna ayurveda a nexweşiyê de wê ew bawerî wê hebê ku wê kesê nexweş wê laşê wê ku ew ji ber sedemên bedenî û zêhnî ku ew ku wê bêahengê wê biafirênê wê, bo wê bêahengiyê rast bikê wê hinek nebet û awayên gûharandina reng û awayê jîyanê wê di wê de wê, rewşên weke dîyatê û hwd de wê, çawa wê, ew bê xistin rewşek baş de wê li ser wê bê sekin in. Li gorî têngîna ayurveda wê, bedenek bi tendurust (dosha) û agni (germehiya serifînê, dhatu (heft bîyên laş ên weke lenf, qas, xwûn, biya rûnê, biya hundur hastu, ava wê) û mala (weke go, mîz û avêtinên din) ku wê ahengekê wê di nava wan de ku ew were çêkirin wê li ser wê bisekinê. Di dewama wê de wê sê aliyên giring ên weke fîzîkî, zêhnî û rûhî û hwd re wê başbûn bi wan re wê û wê li gorî wê bi ahenge nava wan re wê were.

Di dewama wê de mirov dikarê bahsa pergale doşa ku wê xwediyê sê aliyên giring ên weke bi navê Vata, Pitta û Kapha bin. Li gorî wê her mirov wê xwediyê şêwayekê doşayî ê yek ji wan bê û wê bi yê din û jîyanê re wê di ahengekê de bê. Li gorî wê ku mirov di nava jîyanê de bi rengê jîyanê, li xwe meyizandinê, xwarinûvewarinê û hwd re wê, di awayekê de wê di ahengekê de wê, ew wê hebê. di nava bijîşkên doşî de wê, her rewşa kesekê ku ew şîrove dikin wê bikeve beremberê kîjan aliyê

doşî de wê li gorî wê kifşbiikin û wê rêyên başbûnê wê bi wê re wê bikin ku ew pêşbixin û pêşniyar bikin.

Di nava rewşên wekê yên hersê aliyên pergale doşa de wê, di awayekê de wê, rêgezên ku ew bi wê werina fahmkirin wê hebin. Vate wê li ser temenê pergalên sînîrê, qas û hwd re wê, hebê. Di dewama wê de wê, pîtta li ser esas û temenê pergalên serifendinê û valakirin û hwd wê ava bê. Doshajî wê weke ava ku wê madeyên zad ku wê li pergale gerînê wê, barbikê bê.

Têgîna tendurusta hindî wê di awayekê de wê weke ku mirov wê fahmdikê wê li rewşa jîyanê, rengê xwarinûxwarinê, li xwe meyizendinê û hwd ve girêdayî bê. Di wê temenê de wê, di awayekê de wê weke aliyekê wê, bi rewşa ahenge jîyanê ve girêdayî bê. Wê li ser koka xwe wê di awayekê de wê bixwezê ku ew wê werênê ser ziman. Di aslê xwe de wê weke ku em bi 'veda'yên wê re dibînin wê di awayekê de wê, weke ku mirov li ser temenekê zanînê wê kifşbikê. Ji xwe wê têgîna veda'yê jî wê were wateya **zanînê**.

Deramanê Ayurvedîkî yek ji kevintirîn, sistematîk û herî xwezayî ya dermanan e. Lêbelê, ev rastiyek e ku mirov çî warê dermanê bikar bîne, çî warî jî ew teknîkên başkirinê jî terapîstek werbigire, di rastiyê de, sedema aciziyê, pêvajoya saxbûnê, bi tevahî di hundurê hundurê mirov de ye, cîhana giyanî û hestiyarî û herikîna enerjiya laş bê. Ji ber vê yekê, dema ku van metodên terapiya xwezayî fêr bibin û bikar bînin an wan bikar bînin, fêrbûna mekanîzmayên xweya hundurîn, bi kurtasî, naskirina xwe dê di pêvajoya saxbûnê de jî rehetiyek mezin peyda bike

**Weki** din wê di wê temenê de wê dema ku mirov li pêvajoyên tendurustê ên hindî dinerê wê dibînin ku wê, li gorî dîrokzan dihênina ser ziman wê li dora sedsale sêyemin wê, ji aliyê key Asoka ve wê, nexweşxane wê hem bo mirovan û hem jî heywanan wê bide avakirin. Wê di wê de wê, kesên ku şifakirinê dikin wê werênê ser ziman. Di wê demê de wê biqasî ku mirov wê dibînin wê bûdîsm wê di awayekê de wê, bandûra wê di wê de wê di awayekê sazûmanî de wê xwe bide dîyarkirin. Pêvajoyên ku wê bi sedsalan heta wê demê wê bûdîsm wê bijî wê weke ku wê hindûîsmê jî wê di awayekê de wê bide bi sazûmankirin.

Pêvajoya hinduîsmê a pêşî wê li ser temenekê xwezayî a ne bi sazûmanî bê. Di temenekê anamist de wê weke ku mirov dibînin wê di awayekê de wê, were fahmkirin. Di aslê xwe de wê gelek rêgezên têgîna tendurustê ên meseopotamîkî ên kevn wê di nava wê pêvajoya hinduîsmê û pêvajoyên olî ên bûdîsm û brahmanîsmê de jî wê werina dîtin.

Dema ku mirov li temenê wê dinerê wê mirov dibînê ku wê, temenê wê ji vegotin û efsaneyan wê cûda nebê. Wê di wê temenê de wê li ser temenekê mîtolojikî û hwd wê were ser ziman. Di çerçoveya têngîna hinduismê de wê, weke ku mirov dibînê wê weke ku em di çerçoveyek dualite de wê dibînê wê di her rewşê de wê xwe bide nîşandin. Minaq weke brahman û atman, Sucruta û Carakasamhitâ û hwd wê di wê temenê de wê di awayekê teorikî de wê temenekê hizirkî wê biafirênin. Sucruta û Carakasamhitâ wê di temenekê teorikî di temenekê tendurustî û ankû cerrehî de wê zêdetirî wê di temenekê şenber wê xwediyê çerçoveyek têngînî a fahmkirinê wê bi xwe re wê werênê ser ziman. Di çerçoveyek rasyonali de wê di temenekê fahmkirinê de wê bikê ku ew werênina ser ziman. Çendî ku wê têngînên afsûnî û hwd jî wê di wê de wê hebin jî lê wê di awayekê de wê weke ku em dibînin û kifşdikin wê, xwediyê şêwa û awayekê hizirkirinê wê bi xwe re wê biafirênin. Sind'ku wê, li Mohanjo-Daro' wê bi erkolojikî wê lêkolînan wê bikin wê di awayekê di derbarê 'şariştaniyên hinduyî' de wê, hinek nîşanakên di derbarê demên kevnera de. Di aslê xwe de wê, bermehiyên ku wê bibiînê wê zêde di derbarê têngîna tendurustî zêdetirî wê di derbarê awqayekê jîyanî a bi sazûmanî ku wê di hemdemiya xwe de wê hebê wê bi wê re wê xwediyê awayekê bê. Dîtînen ku wê bèn kirin wê di awayekê di hevraziya dîtînen li harappa ku wê li dora penjapê wê werênina dîtînen bin. Wê di wê temenê de wê di awayekê de wê xwediyê rewşekê bin.

Lê di aslê xwe de em dema ku em li nava rewşên mitolojikî ku wê werina ser ziman binerin wê di awayekê de wê bi dîmenî wê hinek têngînên ku wê werina dîtînen wê hebin. Em ku hinekî empatiyê bi wê re bikin wê ji têngîna zanîne a Indra û heta Wişnû û gelek rewşên din ku wê werina dîtînen wê di nava rengê mîtolojiya wan de wê ev têngîn wê hebin.

Li vir di awayekê de wê weke ku em di çerçoveya têngîna Ayurveda' de dibînin wê di aslê xwe de wê tenê wê weke awayekê minaq ku wê di aslê xwe de wê minaqên wê yên din jî wê bi wê re wê werina dîtînen wê hebin. Lê têngîna Ayurveda wê, di awayekê de wê li awa wê yê sazûmanî û hwd ku mirov dinerê wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê li dora demên kevnera ên tîrzanînen de wê weke çerçoveyek hizirkirinê bê. Di wê temenê de wê, di awayekê û bi şêwayekê pêşketinê û çerçoveyên wê yên zanîni re wê bê dîtînen.

Têngîna nîrwana wê di awayekê de wê, li ser têngînek bi gihiştina haz û avîndariya dilî a li ser çerçoveyekê zanîni re wê weke ku mirov dibînê wê, xwediyê şêwayekê fahmkirinê bê. Nîrwana wê di temenekê weke ya

ku mirov wê bi têngîna ayurveda re dibînê wê di ahengekê levkir de bê. Wê di dewama wê de wê piştre wê, weke têngînek tendurustî ku wê gelek bijişkvan wê alaqaşê li wê bidina nîşandin wê, hıfzıssıhha û hidroterapiyê wê derkevina li pêş. Wê ev temenê ku wê piştre wê bê weke aliyekê alaqaşê wê bê temenê rengên din ên pêşketinê. Şariştaniya indus wê di awayekê de wê, dema ku mirov li wê dihizirê wê, dibînê ku wê di demên xwe de wê, hertimî wê bi têkiliyek ji navikê ve wê bi mesopotamiya re wê xwediyê wê têkiliyê bê. Wê di wê temenê de minaq wê zerdeştî ku wê ji dema zerdeşt ve wê li ser dermankirina bi şînayîyan û hwd ku wê weke hûnereka wan ya olî jî bê wê, li wir jî wê bi gelek awa û nebetên ku ew kifşdikin re wê nîşanaka wê were dîtîn.

Di wê temenê de wê mirov dikarê wê di awayekê din de wê di dewama wê de wê werênê ser ziman ku wê, li ser wê temenê wê ji hindistanê û heta meseopotamiya û ankû kurdistanê û îranê wê, hertimî wê xateka ku wê li ser temenê zanîne û jîyane şariştanî ku wê bi hevdû re wê bê temenekê parvekirinê jî wê bibê. Ev wê ne tenê di demên kevnera de wê wusa wê hebê. Piştî wê jî wê li ser temenê wê zanîne wê hebê. Ji brahmanên mesopotamîkî û heta yên hindistanê û pêvajoyên zerdeştîyê û hizra wî ya li wir bicih dibê û hwd wê gelek awayên wê were dîtîn.

Li vir wê, ev alaqa wê li ser temenekê zanîne wê piştî zerdeşt wê bi Manî û hwd re jî wê were dîtîn. Çerçoveya têngîna Manî a bi gîyanî û ankû rûhî başkirinê ku mirov çerçoveya wê derxe li holê mirov dikarê wê bêjê ku wê di awayekê wê rengê de wê dîmenekê berfireh wê li ser temenekê fahmkirinê wê bide me.

Ev temenê têkiliyan wê piştî medî wê têkherin û wê axamanîşî wê werina ser desthilatdariyê wê heta ku wê li hemberî rêza çîya û mergên ingus ku ew bindest bikê wê bi wê re wê bixwezê ku ew di dema ahmaniyan de ew bikeve nava wê hewldanê de. Lê wê di wê rewşê de wê dema ku em li rewşa ahmaniyan dînerin em wê dibînin ku wê li herêmê wê pîrr zêde wê, serwer bin. Wê, di awayekê imparatori de wê xwediyê temenekê têkiliyê e fahmkirinê bin. Dema ku Dara beşek mazin a Asya biindest dikê wê herê sînore hindistanê. Keyê ahmanî Sindh wê, dema ku ew li ser taxt dirûnihê hem wê pêşîya herikînen hêzên iskender wê bigirê û hem jî wê herêmên ku wê dara bindest kirina wê bidest bixê û wê heta ku wê nêzî herêmên misrê wê di awayekê de wê, bandûra xwe wê li herêmê wê bide nîşandin. Wê demek nû bi imparatoriya Ahmanî re bide nîşandin. Sindh wê di awayekê de wê weke ku mirov dibînê wê hinekî jî wê serkevtinên xwe wê deyndærê sazûmanaka artişî ku ew ji gelek

aliyan ve wê li wê bihizirê bê. Heta ku wê bihijişk û zaneyên wê tendurustê ku wê bi sazûmanî wê hebin wê, di temenê de. Di aslê xwe de wê sazûmana ku wê di wê warê de wê çêbikê wê di awayekê de wê, rewşa têngîna tendurusta roma ku wê bi sazûmanî di nava artişê de avakirîya wê bînê berbîra me. Di wê temenê de wê di awayekê de wê, ew wê, derkeve li pêş.

Sindh wê, komek mazin a bijişkan wê di awayekê de wê ava bikê û wê bi wê re wê, dema ku wê di rewşek xirab de wê di cih de wê, karibin alikariyê bidin. Lê mesopotamya wê di awayekê de wê weke navend derkeve li pêş û wê di wê temenê de wê, hindistana demê wê di nava têkiliyek serwerîyê de bê.

Di warê têngîna tendurusta demê de wê, têkiliyek pêşketî wê bi rewşa jîyanê re wê hebê û wê serkeve li pêş. Di rewşa jîyanê de wê rewşên weke yên nebaşîyê ên jîyanî ên fizîkî û ne fizîkî wê di zikhevdû de wê werina hildan li dest. Di têngîna tendurustî de wê gotina 'gûharandina jîyanê' wê weke aliyekê wê yê din ê giring wê xwe bi wê re wê bide **dîyarkirin**.

### **Têngîna tendurustê di demên kevnera ên li girêkê**

Di aslê xwe de em dema ku demên tendurustê ên li herêma girêkê werênina ser ziman wê bi wê re wê, weke dem û serdemek din a nû ku wê bi wê re wê di çerçoveya pêvajoyên aqil de wê destpêbikê bi wê re em divê ku wê werênina ser ziman. Wê di wê temenê de wê demên felsefeyê ku wê werina destpêkirin wê di wê de wê, têngîna tendurustê ku wê pêşkeve wê, di temenekê weke destpêka têngîna tendurustiyê ên demên hemdem jî wê bi xwe re wê werênê li holê. Ber vê yekê wê demê em dikarin di bin du dîmenan de wê werênina ser ziman. Diîmenê pêşî di çerçoveya herêmê û demên berê yên berê û xûsîsî bi herêmê re wê fahmbikê û di demê din de jî wê bi pêvajoye felsefeyê ku wê destpêbikê û wê di çerçoveyek serdemî de wê weke demek nû a aqilî wê pêşkeve wê dikarê wê werênê ser ziman.

Pêşketina aqilê felsefeyê wê bi xwe re wê, demek nû wê bi aqilî wê dest pê bikê. Ev wê di wan waran de jî wê, bandûra wê li wê hebê. Di aslê xwe de wê mirov dikarê wê di dewama wê de wê werênê ser ziman ku wê demên kevnera wê jî em dikarin wê di du temenan de wê werênê ser ziman. Ji demên homeros û heta **demokedes**, empodokles, epikharmos, Alkmaion, hipokrat û hwd wê weke demekê wê werênê ser ziman. Ji dema van filosofan û hwd jî wê weke demek nû a din wê dikarê



wê di wê temenê de wê bide destpêkirin û wê werênê ser ziman. Wê heta vê demê wê, weke demek mitolojikî wê xwe bide dîyarkirin. Di wê demê de wê filosofên weke hipokrates wê derkevin. Hipokrat wê di aslê xwe de wê, weke destpêke wê di hizra tendurustiyê de wê weke ku wê hanîn li ser ziman wê bide destpêkirin. Hizrên wî li ser mijara tendurustiyê na û ew bi tememî xûrefe û ankû aliyên bi wê rengê bi têtîna tendurustiyê red dikê. Di wê temenê de ew di temenekê şenber de wê, di wê temenê de wê, dikarê bi hizrên wî re wê werênê ser ziman.

Li kosê wê piştî wê dibistana perwerdekirina têtîna tendurustiyê ku wê pêşkeve wê, di wê temenê de wê hizrên wî û şagirtên wê temenê wê biafirênin. Şîroveyan ku wê hipokrat wê bikê wê bi wan re wê têtîna baweriyê û ankû olê wê ji ya tendurustê wê cûda bikê. Wê bêtê ser ziman ku wê nexweşî wê ji yazdanan lê wê ji sertûmercên xwezayî wê biibn. Wê di wê temenê de wê di awayekê de wê bi wê re wê hizrên xwe wê werênê ser ziman. Wê di wê temenê de wê hizrên xwe wê werênê ser ziman ku wê têtîna tendurustê wê bi serê xwe wê bixwezê ku ew bi şert û mercên mirovî ên xwezayî re wê fahmbikê. Wê li ser temenê fîzyolojikî wê bixwezê ku ew şîroveyekê bi wê re bikê. Hizrên wî ji aliyên pisagor ve jî wê bi başî wê werina pêşwazkirin û herê kirin.

Hipokrat wê di awayekê de wê, di wê temenê de wê hizrên xwe wê werênê ser ziman û bêjê ku nexweşî wê di nava xwezaya wê de wê baş bibê. Wê bi wê re ew wê, pêşxistina dermanan jî wê di awayekê de wê pêşbixê û dema ku wê dermanek wê bikarbênê û ew derman li nexweşiyê newê wê, ew wê, bi gûharênê. Di wê temenê de wê têtînekê bi dermangeriyê re jî wê pêşbixê.

Di wê çerçoveyê de wê dema ku mirov dihizirê wê, di wê demê de wê, hizirkirin wê regekê nû wê bi pêşketinaê rengê hizirkirinê ê felsefeyê re wê bistênê. Di awayekê de wê mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê êdî wê li ser temenekê şenber û weke ku wê hipokrat wê werênê ser ziman wê 'ji xûrafeyan dûr' wê werênê ser ziman.

Di rewşa fahmkirinê de wê aqilê mirov wê êdî wê li şûna ku wê di temenekê serxwezayî de wê bihizirê û wê li sedemê wê bigirê wê, bi wê re wê sedemê wê bi hebûna wê re êdî wê bikê ku wê hizirbikê û wê bi çerçoveya sedem-encama wê re wê di awayekê de wê 'li ser xwezaya wê re' wê bikê ku wê werênê ser ziman. Di wê temenê de wê, dema ku wê, empedokles wê herê sicilya wê li wir dibistana felsefeyê ku ew li ser wî re wê were vekirin wê di çerçoveya hûrgilkirina rastiyê bi hebûna wê re wê li wê bihizirê. Ji aliyê tendurustî ve wê mijara rayên xwûnê û

pompakirina wê re wê di awayekê de wê bikê ku ew wê werênê ser ziman. Di awayekê de empodekles li ser reşa xwarinê û di awayekê de ku mirov li nefse xwe serwer bê wê bi wê re wê werênê ser ziman (çav: Lisa Rosner, *Medical Education in the Age of Improvement: Edinburgh Students and Apprentices 1760–1826* (1991). Li gorî wî, di awayekê minaq xwarinê de li gorî mirov dikarê bixwê, ankû ji zêde xwarinê xwe girtinê û hwd wê di awayekê de wê li wê bihizirê (çav: Deepak Kumar, "India" in Roy Porter, ed, *The Cambridge History of Science: Volume 4: 18th-century Science* (2003) pp. 680–83 **Unschuld** (2003),).

Di mijara fahmkirinê de wê, di wê temenê de wê weke aliyekê wê yê giring wê mirov çawa digihijê fahmkirinê û dema ku mirov derk dikê wê çawa wê ew wê bibê wê li ser wê were sekin in. Rêya di temenekê xwezayî de hizirkirinê wê di wê de wê derbas bibê. Minaq wê Alkmaion wê, meji weke hemû awayên rûhiyetî ku ew rêve dibê û di dewama wê de wê werênê ser ziman ku wê, dema ku mirov ji derve derkekê dikê wê bi rêya sehan wê bigihêna gîyanên di mejî de. Li gorî wê deng wê di gûh de wê li valahiyekê wê bikeve û wê biighijê û gîyanê. Di awarê dîtina bi çav de jî wê weke pêvajoyek bi sê pêpelokî wê bibînê û wê bînê ser ziman ku wê dîtin di çav de ku wê were dîtin ew çîrosk wê bi wê bigihijê wê ava di çav de bin. Di dewama wê de wê werênê ser ziman ku wê aqil û xêw wê çavkanîya wan wê bihistînên me yên ku ew dihên dibin bin (çav: Lisa Rosner, *Medical Education in the Age of Improvement: Edinburgh Students and Apprentices 1760–1826* (1991) .

Di dewama wê de wê, Epikharmos wê kesekê ku ew pêşî li pisagor dihisênê û piştê wê li ser hizrên wî re wê alaqaaya wî li felsefeyê wê bibê û wê piştê wê di warê bijîşkîtiyê de wê, xwe pêşbixê û wê bidest xwe pêşxistinê wê bikê. Ew hebûna tendurustê di çerçoveyekê de weke li gorî xwezayê dihênê ser ziman û li gorî wê xirabûna tendurustê wê weke rewşek ne li gorî wê rewşa xwezayê ku wê pêşkeve bê wê bînê ser ziman. Ew jî wê di awayekê de wê, xwezayê wê weke temen wê hilde li dest û wê, di awayekê dermankirin û tendurustê de wê, xwe di awayekê zêde baş de wê karibê bigihênê û pêşbixê (çav: Lisa Rosner, *Medical Education in the Age of Improvement: Edinburgh Students and Apprentices 1760–1826* (1991).

Weke Epikharmos wê Demokedes jî wê, pêşî kesekê ji qrotonî bê û wê di derbarê zaneyên tendurustî de wê xwediyê fahmkirinê bê. Lê piştê wê, bigerihê û wê heta Aigina'yê wê herê û wê li wir wê bidest kirina bijîşkîtiyê wê bikê. Piştî wê re wê, navê vî filosofê tendurustê wê di wê

warê de wê derkeve ku wê hinek rewşên nexweşîyê ku wê, bijîşkên misrî ku ew di zanîna xwe ya başîyê de bi xwe bawer in ku ew nikarin bigihênina tendurustê û ku ew dikê wê li ser wê re wê li herêmê wê bigiştî wê navê wî derkevê.

Heta ku wê dem wê were dema hipokrat wê di aslê xwe de wê, demek pirr zêde wê bi wê rengê wê bi zanînê wê derbas bibê. Ev dema destpêkê a felsefeyê ku wê di wê de wê tendurustî wê pêşkeve wê di wê de wê filosof jî wê weke filosofên bijîşk wê bibin û wê derkevina li pêş. **Dema filosofên bijîşk** wê di wê temenê de wê derkeve. Di wê demê ku wê di wê de wê, filosofên bijîşk wê pêşkeve ji dibistanên ku wê di wan de wê aqilê tendurustê wê bi felsefeyî wê were pêşxistin ji ya kos û knidos'ê û heta dibistana tendurustê a iskenderîya wê di awayekê de wê derkeve li pêş. Dibistana iskenderiya wê di wê warê de wê piştî hipokrat û dibistanên kos û knidos û pê de wê pirr zêde wê weke deverêk navder û navend wê derkeve li pêş. Di wê temenê de wê di awayekê de wê ev der wê êdî wê di wê de wê filosofên bijîşk wê bîn û pêşkevin (çav: Lisa Rosner, *Medical Education in the Age of Improvement: Edinburgh Students and Apprentices 1760–1826* (1991).

Di tégîna tendurustê de wê, di wê demê de wê nîqaşên zêde giring wê werina kirin. Mirov çawa dikarê nexweşîyekê fahmbikê û li hemberî nexweşîyê çi bikê wê hipokrat wê bi gotina 'di xwezayê kesê nexweş de wê tekoşîn wê hebê. Bijîşk wê di rewşa nexweş û başbûnê de wê, alikariyê ku wê jêre bikê bê.' Ligorî wî, xweza wê bijîşkê nexweş bê. Ya ku wê rê li wê vekê jî wê ew bixwe bê. Xweza pêwîst nîna ku ew her tiştê zanîbê. Bê ku ew ji me her tiştê fêrbibê wê ya pêwîst wê bikê.' (çav: Weiner, Dora B. (1994). "La geste du Pinel": The History of a Psychiatric Myth". In Micale, Mark S.; Porter Roy (eds.). *Discovering the History of Psychiatry*. New York & Oxford: Oxford University Press. pp. 232–47 )

Hipokrat wê di wê warê de wê di aslê xwe de wê weke filosofekê bijîşk ku wê di çerçoveyek zanyarî de wê hilde li dest û wê bînê ser ziman bê. Di warê hizirkirinê wî yên li ser rewşa tendurustê de wê di awayekê de wê, rewşa nexweşîyê, salixkirin, çawa dikarê dermankirin were kirin, nêzîkatîya li nexweşîyê û li nexweş wê ji xwe re wê, bikê mijar û wê li ser wan bihizirê. Di wê temenê de wê ji ber wê nêzîkatîya wî bê ku ew wê, nêzîkatîya wî heta roja me wê weke nêzîkatîya bijîşkî wê were dîtin û wê bi navê wî sûndxwarin weke bi navê '*sunda hipokrat*' wê di wê bê

ser ziman (çav: Lisa Rosner, *Medical Education in the Age of Improvement: Edinburgh Students and Apprentices 1760–1826* (1991).

Hipokrat wê mijare bijîşk û bijîşkîtiyê wê hilde li dest ku ew dema ku ew mijarê nexweşiyê hilde li dest wê çawa bê. Di wê temenê de wê gotina 'bijîşkên nezan' û yên 'ku ew di nava xalkê de nîqaş dikin û dizanin' wê ji hevdû cûda bikê. Ew di wê temenê de wê mijarê weke aliyekê ku ew wê çawa wê bi zanîna xwe wê baweriyê bide xalkê û wê bi rasti jî wê kesekê weke bijîşk ê baş bê wê li ser wê bisekinê (çav: Weiner, Dora B. (1994). " 'La geste du Pinel': The History of a Psychiatric Myth". In Micale, Mark S.; Porter Roy (eds.). *Discovering the History of Psychiatry*. New York & Oxford: Oxford University Press. pp. 232–47 ).

Di wê temenê de wê biqasî ku wê bi zanîna wî xalk bawer bikê ew jî bi heman rengê têrzanîn û bi xwe bawer bê wê, giring bibînê. Weki din wê gelek şewayên nexweşiyê ên weke minaq 'nexweşiya pîroz' ku wê were ser ziman ku ew weke 'nexweşiya epilepsiyê' bê wê derxê li holê. Hipokrat wê di wê temenê de wê nexweşiyê wê fahmbikê. Ew bi nêzîkatîyek felsefeyî lê dinerê û wê dikê ku ew wê fahmbikê. Wê di nêzîkatîya xwe de wê weke hevdû nêz bibê û wê farqê nekê navê. Di wê temenê de wê, 'nêzîkatîya hipokrat' wê piştî wî ji aliyê platon ve jî wê di wê temenê de wê minaq bê dayîn. Di dewama wê de ew wê, bête ser ziman ku hipokrat nêzîkatîyek felsefeyî li tendurustiyê kiriya. Wê di wê temenê de wê heta ku wê, di nava danûstandinên xwe de wê bête ser ziman ku ew pêşniyardikê hipokrat bê xwandin. Piştî hipokrat wê hizrên wî di nava filosofên weke yên aristo û Menon de jî ku wê li ser tendurustê ji hizrên hipokrat gavê biavêjin û wê bête ser ziman wê, bêjin ku mirov xwarinekê bixwê û baş ne serifênê wê ew karibê bibê sedema nexweşiyê. Di wê temenê de wê, di warê rast li xwe ne nerîn, li paqijiyê ne muqayet bûyîn û hwd jî wê weke sedema wê bê dîtîn. Nêzîkatîya hipokrat wê di wê temenê de wê weke nêzîkatîyek xwezayî bê. Minaq gotinên wî ên weke 'erka bijîşk ji xwezayê nexweş re bibê alîkar.' 'Di tendurustê de ya esas ew a ku zirer li nexweş nebê.' 'Tendurust ji sê tiştan pêktê ji nexweş, bijîşk û nexweşî yê.' 'Her nexweşî wê sedemek wê hebê, ti nexweşî bê sedem rû nadê. Divê ku ew sedem were fahmkiirn û dermankirin jî li gorî wê bê kirin' 'Di nexweşiyê de ku awa û sedemên ji cihê newê kirin wê di şewayê dermankirinê wê biravê li ya hesan.' 'Di dest de ku wê hinek şewa hebin divê ku li ya hindik li berçav xwe li wê bigirê.' 'Divê li mirov li gorî xûy, ardnigariya

ku ew dijî û rewşa bedenê bihizirê.' (çav: Weiner, Dora B. (1994). " 'La geste du Pinel': The History of a Psychiatric Myth". In Micalé, Mark S.; Porter Roy (eds.). Discovering the History of Psychiatry. New York & Oxford: Oxford University Press. pp. 232–47 ) ..

Di wê temenê de wê dema ku mirov li nava gotinên hipokrat dinerê wê di awayekê de wê li wê bihizirê ku wê çawa wê, di temenekê baş û bi xwezayê wê re wê başkirin wê bi wê re wê bê pêşxistin. Ew di wê temenê de wê, aligirê baş fahmkirinê ya di nexweşiyê de. Ber ku wê baş zanîn û fahmkirin wê di rewşa dermankirin û dana şifayê de jî wê, destê mirov wê xort bikê. Di warê têgîna tendurustiyê de wê di wê demê de wê zêdeyî wê rewşek perwerdeyê wê pêşkeve. Minaq wê dibistana knidos wê weke pêşbazê ya kos wê bibê û wê, li ser rewşa nexweşiyên hundirîn wê pirr bi hûrgilî wê bikê ku ew herê li pêş. Di wê temenê de wê di gelek awayan de wê, lêkolînên li ser nebetan jî wê weke ku wê gotin wê bi wê re bê dîtin ku ew dikê. (çav: Weiner, Dora B. (1994). " 'La geste du Pinel': The History of a Psychiatric Myth". In Micalé, Mark S.; Porter Roy (eds.). Discovering the History of Psychiatry. New York & Oxford: Oxford University Press. pp. 232–47 )

Dibistana tendurustiyê a knidos wê di awayekê de wê li ser rewşa dîtbariyê a laş û ankû bi dîmenî lê nerînê re wê xwediyê rewşekê û renekê dîtînê bê. Wê dema ku mirov li awayê wê pêşketinê dinerê wê bi wê re wê were dîtin ku weke aliyekê bi rewşa derûnî û ankû şêwayekê ê ku mirov dikarê weke derûnîya fîzyolojîkî wê fahmbikê re wê xwe bide nîşandin. Li ser wê temenê re wê, di awayekê de wê, li ser çavdêrî û hewldanên hûrgilîkirinê û fahmkirinên ji nava xwezayê wê ji xwe re wê weke aliyekê giring wê bibînê. Wekî din wê li ser nebetan jî wê weke ku mirov dibînê wê lêkolînekê wê bikê (çav: Weiner, Dora B. (1994). " 'La geste du Pinel': The History of a Psychiatric Myth". In Micalé, Mark S.; Porter Roy (eds.). Discovering the History of Psychiatry. New York & Oxford: Oxford University Press. pp. 232–47 ) .

Di wê temenê de wê, di awayekê din de wê weke ku mirov dibînê wê ev rewş wê piştî hipokrat wê hinekî wê bi gûharê. Di aslê xwe de wê Hipokrat wê di ware hizra zanyarî a tendurustî de ku mirov wî weke destpêkekê bîne ser ziman wê rast bê. Wê di wê temenê de wê, di awayekê de wê, were dîtin. Piştî hipokrat wê, weke şagirtekê wî yê bi navê Diokles ku wê pirr baş li ser hizrên hipokrat re wê xwe perwerde bikê û pêşbixê jî wê, bixwezê ku ew di temenekê zanyarî de ew hizra tendurustiyê ew bi sazûman bikê. Di wê temenê de wê, li karistonê wê

dibistanek tendurustê wê vekê. Wekî din wê ji fêrên dibistana tendurustê a iskenderiya, ya sicilya û kosê wê sûdwegirê. Wê hemûyan wê di awayekê de wê, di nava xwe de wê, bixwezê ku ew hevgyrtinekê (sentezekê) ew çêbikê. Wê di wê temenê de ew aliyê derûnî ê dibistana sicilya a li pêş jî wê hil û aliyê anatomikî ê ku wê hipokrat derxistî li pêş a dibistana kosê jî wê derxe li pêş. Wê herdûyan wê di awayekê de wê hevgyrtinekê wê di nava wan de wê çêbikê û wê bi wê re wê xwe bigihênê têtînek 'fizyolojikî' ku ew bi wê re wê têtînek tendurustê a şenber wê bixwezê ku ew bi wê bi zanyarî pêşbixê. Wê dikê jî. Di dewama wê de wê, ew jî wê di awayekê de wê, di wê temenê de wê, têtîna fizyolojiyê wê di wê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê temenekê wê yê teorîkî wê di wê temenê de wê çêbikê û wê werênê ser ziman. Diokles wê tiştêkê din wê bixwezê ku ew wê bikê. Wê **disseksiyonê** wê pêşniyar bikê û wê di wê de wê bixwezê ku ew bê kirin. Wateya wê jî ew bê ku wê laşên miriyan bên vekirin û li ser wan û uzwên wan lêkolîn bên kirin. Di wê temenê de têtîna fizyolojikî a tendurustê pêşbixê û bigihênê temenekê bi sazûmanî a zanyarî (çav: Weiner, Dora B. (1994). "La geste du Pinel": The History of a Psychiatric Myth". In Micale, Mark S.; Porter Roy (eds.). *Discovering the History of Psychiatry*. New York & Oxford: Oxford University Press. pp. 232–47 ).

Di dibistana Diokles de wê bi zêdeyî wê weke ku ew jî wê li ser wê bisekinê û wê li ser wê bide sekinandin wê anatomiyê wê bikê temenekê perwerdeyê û wê li ser wê bihizirê û wê hizrên xwe wê bênê ser ziman. wekî din wê li ser rewşa nebetan û bikarhanîna wan a weke derman wê bisekinê û wê di wê temenê de wê bikê ku ew xwe bigihênê têtînekê. Weke ku em dizanin Diokles wê rêwîtiyên wî yên li mesopotamîya wê bibin û ew di wê temenê de wê, di derbarê nebet û çanda bikarhanîna nebetan de wê pirr zêde wê ji wan wê fêrbibê. Wê di wê temenê de wê, ew wê xwe bitemen bikê. Wekî din wê li ser pergâlên serifendinê ên laş û hwd wê bisekinê. Di dewama wê de wê, rewşên nexweşiyê wê bixwezê ku ew wan salixbikê û li ser wan re ew xwe bigihênê li têtînekê. Di wê çerçoveyê de wê qaydkirinên li ser rewşên nexweşiyên re ku wê bikê wê di awayekê de wê di mejiyê wî de wê bê temenek baş bo fahmkirina nexweşiyên. Di dewama wê de wê weke aliyekê wê yê din ê giring jî wê, mijara rayên laş wê di awayekê de wê, bikê ku ew fahmbikê. Di wê çerçoveyê de wê, li ser wê bisekinê. Li ser rayan re wê bixwezê ku ew rewşa laş wê fahmbikê. Di wê temenê de ew dibînê ku wê rayên xwûnê wê di hemû deverên laş de hena û wê di wan re wê xwûn biherikê li her

